

û dilê xwediyê dewatê bi ser xwe ve bikişînin da ku wan di nav lîlandin û lingên mazovanan de ji bîr nekê; "Çawa me li derve û li ber van kurbayên zivistanê bi-hêle, em di sibeyên rojên havînê de xwe li ber agiran germ dikin, ma qey ew nizane ku kirîf bi hûnikê re arsimî dikevin". Kirîfê ku dide daholê dibêje hevalekî xwe û herdiçe, ew kopalê xwe germ dike.

Mazovan belav dibin piştî ku bûk û zêve dixin odeya wan, tenê diya bûk û zêve li ber deriyê wan û li benda nêşana keçanî û mêraniya law û keça xwe rawestî dimînin. Bavê zêve jî di oda dî de diçe û tê; li benda pîreka xwe ye, ku ew jê re mizgîniya mêraniya lêwik bîne da ku ew jî devê teka xwe di derî re derxe û mizgîniyê, bi du bireyan, ji gundê Mîrka re biweşîne.

Di vê dema ku ewî nedikarî tutiştî din bibhîsta kirîfek seriyê xwe di derî re dirêj dike û bi dengê kut-qutî dibêje wî; "Ez benî bi Xwedê kabokên me ji serma re ziwabûn, ji kerema xwe bêje zaroyan bila cihekî ji razana me re peyda bikin". Lê her ku wî gotinek fikir carekê li çavê wî dinêrî û vêre jî li destê ku tek têde dimeyizand ku ew ber bi zikê wî dirêj kirî lê na.

Bi gotina dawiyê re tîrsa wî bi cih tê û xwediyê dewatê bi ser wî de diqîre; "Ez li çime û ew çi ji min dixweze. Tenê hûn ji min kêmin, de rahêjin defik-mefikên xwe û dêv bi malên xwe din; we pereyên xwe sitandin

ma hîne çiyê din ji min dixwezin". Lê kirîf zû-zû wî bernade û her ku dengê ewran xortir dibe û çavên wî bi birûskan dikeve û têderdixe ku ewê heya bi heftnîvşevan negihên mal, berger û lavlavên wî kûrtir û bilindtir dibin û gava xwediyê dewatê dibîne ku nema gotin bi wî kar dikin, ew radihêje tekê û li wî nîşan dike, dihêle ku ew û hevalên xwe heftgedûkan bi paş xwe din.

Ji berî ku ew ji gund bi derkevin û li ser milê rastê çavê wan bi Husê kal dikevin ku ewê ji ser piştê ban de li wan dinire. Ew dîtina wî weke keyseke dibînin ku xwe li gedûka mala wî badin û gazinan jê bikin ku wê şeva sar û tarî di bin baskên wî de biborînin. Derbasbûna wan di gedûkê re dihêl Husê kal mîna pisîkekê xwe di sancê werke û ji dervayî mal bêje wan; "Bi Xwedê heya wîn li hewşêne, ezê ne li malbim. Qey hûn dixwezin ez jî wekî we li derve bimînim û pîrek dûvê me gişa di ber me re ke".

Ew li hev dixurcilin û ji neçarî, û nemaze dema ku seriyê pîreka malê û sibirkeya di dest wê de dibînin, ji hewşê derdikevin û yek bi nîvdengekî bilind dibêje; "Eger ku kewran kete hewşê, seg dê xwe di kimanan werkin". Bi gotina wî re ew li dû hev rêzdibin û ji gund derdikevin, heya wê hîngê jî rişrişka baranê dest pêkiribûn.

(5)

Rojekê jî helbestvanekî me, helbet wê hîngê nedizaniê dê bibe helbestvan û ne jî koma zarokên bi wî re, ku derketibûn binê gund, geliyê herî kûr û karikên wan jî li pêşiya wan diçêrîn. Ev koma zaroka bi xwe û lîskê de dikevin û da ku ew ji lîska xwe neyên birîn, ew çend hevalên xwe, yên ku gûça wan lê dibe, ber bi mal ve dişînin; şîtkî cîranê Mîrka ne, da ku xwarinê ji wan re bînin.

Zarşivan, xwarina wan dê nanê ku bi xwê hatibe sitiran û penêrê ku bi kela ava şorê hatibe girtin û di rojêke biharê û piştî lîskeke dijwar ewê nepirsin ziko te çî xwar û çî nexwar, bêyî ku bê bîra tukesî ka av bi wan re heye yan na. katek di ser xwarina wan re naçe û ziman di devê wan de dibe kulavekî ziwa û bi sû-sê girdavan ew xwe dighînin cem sarinca jorî gundê Mîrka.

Erê ew gihîştin ser sarincê lê çaxa berdana cot û vegera şivanan çûbû û zû-zû rêvêketina, ku yekî li şûna danê nîvro mayî dê bi wir neketa da ku ew karibin sîtila wî jê bigrin û hinek av ji sarincê hildin. Lê pir dirêj nakê û cotariyek digel dewarên xwe ve bi wir dikeve û avê ji dewarê xwe re berdide oliqê kevirî.

Piştî ku ew û dewarê xwe têr av dibin, zaroyên ziwa sîtila wî jê dixwezin da ku ew jî karibin ziwabûna xwe

vemrînin, lê mêrik bêguhdana bergerên wan sîtila xwe dixê xurcika xwe û ji ser sarincê verê dibe û hêsrê çavên wan bêtir tîr dike. Çendekên din tên lê hemû radihêjin sîtilên xwe bê yî ku tu kes li ziwabûna çavên wan bipirse.

Dema ku zaro bêçare dimînin û bi berdana avê di oliq de, ji aliyê cotariyê herî dawî ku bi ser sarincê ketibû, û ji berî ku dewarê wî dêv têxêne avê, çend zaro û bi hev re seriyên xwe dixînin oliq û rê li pêş dewêr digrin, lê M. Hemo dest davêje sîtila dest wî û jê distîne û bi valakirina wê re êşeke tûj di hinava wî de derdibe.

(6)

Carekê jî rihsipiyên gundê Mîrka li hav dicivin û biryara rê dûzkirina ku gundê wan bi riya giştî ve girêdide distînin û ew roja din dikin roja sozkombûna xwe; "Hesin hîne germe bikut". Kesek dibêje civatê û li ser evê sozê belav dibin.

Piştî ku herkes dighe mala xwe û derengî şevê heryek dibêje xwe; "Mala me nekeve çima nehat bîra me ku siba heryek dê, ji bo xwarinê, çi bi xwe re bibe". Piştî evê pirsê heryek dighe ewê baweriyê ku siba cîranên wî dê hertiştî bi xwe re bînin, lê tenê ewê avê ji bîr bikin û bi gihîştina evê baweriyê re, herkes bi razîbûn seriyê xwe datîne ser balîv û bêxem di xew ve

diçin.

Di roja din de, dema ku nîvro dibe û li seriyê hevdu komdibin da ku taştîyê bi hev re bixun bala xwe didinê ku ji bilî avê tutîştî din bi xwe re ne anîne û.... Ew roj ev roje û ew rê hîne wilo nîvbirî maye.

(7)

Mirka ...

...

...

Dilê Kurdaxêye.

Cindirês 2000

Rêçikên Gund

(1)

Dibêjin ku mirovekî Ezdî li ber Xwedayê xwe gerî û lav jê kirin ku rizqê wî jî mîna yê cîranê wî yê Musliman bol û fireh bibe. Kin-dirêj, rojekê ji rojên Xwedê û yê Ezdî di xew de bû, Xwedê ferîstekî xwe dişîne û jê re dibêje; Tu yê herî wî bighînî ber qulên ku rizqê her yekî tê re dadikeve.

Dostê me yê Ezdî li piştta ferîştê Xweda siwar dibe û derdikevin qatê ezmên yê heftan, camêr dinire ezmanekî qulquliye, hinek hingî firehin, Xwedê bi xwe jî dikare tê re dakeve û bibe para xwediyê wê qulê û hin qul jî hindî tengin, tena kuncî jî tê re derbas nabe.

Dema yê Ezdî li qula rizqê xwe dipirse, ferîştê ku ew hilgirtî, wî li bin qula herî biçûk disekinîne. Camêrê Ezdî wê hîngê tê dighe ku çima ewî hertim sêfêl û perîşane, ji qehra û bi bihana ku qula rizqê xwe fireh bike, bi kerb û dilşewatiyeke kizirî, tiliya xwe li wê qulê dide.

Bi qêrîn û êşeke tûj, ku di paşiya xwe de dipelîne, ji nav nivînan tê avêtin û tê derdixe ku wî tiliya xwe di paşiya xwe de çikandî.

(2)

Dîsa dibêjn ku meleyekî Musلمانan di nav çiyakî re derbas dibû û di devereke teng de zibûnê wî bi ber kelemê dikeve û tê kişandin. Ji yê meleye ku yekî ew girtî û dixweze çend peran bide wî, ew ji bo wê yekê di cihê xwe de bê liv dimîne û dema çaxa nimêja nîvro dibe, bêtî ku xwe bilivîne û li pê nimêja xwe dike û bi dengê bilind lavêjan ji Xwedayê xwe dike.

Ji bedşansa wî bû ku niçîrvanekî xwe di wê kelemê de veşartibû û çavnêriya wî dikir, de ka çêroka wiyê di ku de û çawa kuta bibe, lê gava lavêjên mele dibêse, ew xwe nagre û her ku mele lavêjekê ji Xwedê re hildide û xwestekê ji wî dike, yê niçîrvan bi gotina "na" bersiva wî dide.

Di dawiya dawî de û piştî pir berger û nayên ji aliyê niçîrvan - Xwedê ve, meleyê me bi qehir bi zibûn digre û dikşîne, bi wê kişandina wî re, zibûn diçire û dibe du perçe û pêre jî ew dibêje Xwedayê xwe.

- Bila tu jî zanibî ku min nimêjên xwe bê avdaz dikiirin.

(3)

Carekê ji caran, rihme li dê û bavê guhdaran, kalemêrek radihêje tenekeyekî dimsê şêrîn û mîna gundiyan

xwe dêv dide bazara bajarê Efrînê da ku bifroşê û ji xwe re şirwalekî bikire.

Kalemêrê me tenekeyê xwe dixwe nav nigên xwe û bi dengêkî duduwan bang dike.

- Werin dimsê Entabê.

Çendekên nêzîk li seriyê wî kom dibin û ji kalemêr dixwezin ku ew devê teneke veke da ku karibin wê biçaşin. Tiliyek ji vir yek ji wir, dihêle dimsê kalemêr li tevayî gorepana bazarê belav bibe û mirov, mêş û kelmêş êrîşî ser wî tenekî bikin.

Dem dizîvire, ro dighe dev-devî nîvro û kalemêrê me hîn li çûçika rûniştiye û tenekeyê wî jî di nav linga de ye. Ew dinire ku ji dûr ve yekî xwe lê girt û hat, heya bi wê hîngê tektûk li bazarê mabûn. Gava ew camêr tiliya xwe bi teneke ve dike, pirtinî bi devê wî dikeve û dibêje yê kalemêr.

- Malxerab, ev çiye.. bes tu nebêjî ku min dimsê te tîrşkiriye.

(4)

Rojekê jî pîrejinek, û piştî ku çend rojan mastê bizina xwe ya sêwî guhandibû hevdu, ew ketibû ser riya bazara şiyê. Wê pir hêvî û xwestek di ber dilê xwe re dibirin û tanîn û di nav wan de winda bûbû, geh digot:

"Ezê dolemeyeke xwe bikirim". Piçek nediçû ew doleme bi şalekê diguhert û di dawiya dawî de li kîlok hene rawestî.

Gava dighe wê yekê, ew bi firotina mastê xwe dirame; divê hinekî biha bifroşe da ku karibe kîloyê henê bikire û bi dîtî û pîrskirina zibûnê yekê re ku kîloyê mêt bi panzdeh perên Sûriyê nafroşe, pîrejina me seriyê xwe vediçerpîne û helbika mêt ji ser seriyê xwe difirîne, mastê çend rojan li ser riya bazara şiyê belav dibe û pîrejina reben bê porê henekirî vedigere mal.

(5)

Di gundekî weke gundê Qermîliq de, helbet dê bizin û mirîşk bi bin têlên sînore kevin û dîsan jî dê netîstekî nuh be ku em bibêjin; Di gundekî wilo de ku ji bilê ezmanekî rût û dûr û wan çend mirîşk û bizinan lê tinebe dê bihêle ku xort ber bi bajar û welatên biyaniyan ve birevin û bihêlin ev kalepîrên van gundan, rojên xwe bi çêrandina van mirîşk û bizinan li dor têlên sînore biqedînin û bi wan şabibin.

Di rojê buharê de ku dihêst dilê yekî bi xwarina kerengan bîponije, Heso û Meyrê ji mal bi der dikevin piştî ku, wan çend karik û herdu bizinên gurî didin ber xwe. Dûr-nêzîk ew dighên Lêçe da ku ji leşkerên Tur-

kan bi dûrkevin û çavên wan ên şîn nebînin. Lê ji bextreşiya wan û ji berî ku kalê Heso wan çend pîvokên ku bi xilç hilkişandibûn bi pîra Meyr re buxe, carekê radibe ser xwe û dixweze binire ka karik bi ku ve şimitîne.

- Meyrê, em û karikan ve çûn. Ew bi gotinê re xwe di zinarê, ku derketibû ser, werdike.

- Çi çêbû. Pîra Meyr dipirse û teneya pîvokê di gewriyê de disekine.

- Laşkerên Turk an em hilînan. Kalê Heso, bi rûyekî beravêtî, bersivê dide.

- Malxerabo, min got qey çi çêbû. De rabe her pêşiya karikan û wan bi ser me de vegeêre. Pîra Meyr, bi dilekî sar, jê re dibêje.

- Ma hîne çi ji vê yekê xerabtir heye.

- Bêzirav ma em çiqasî dûrî sînore ketine, ewê ji me çibkin û bi ser de jî yên gunehkar ewin; ew drbasî nav erdên me bûne. De rabe here û karikan yalde.

- Ez ne ji bona ku em nêzîk an dûrî sînore ne ji wan ditirsim.

- Ma çiyê din heye da ku tu ji wan bitirsî; tu ne yekî çeteyî ku te sînor talankiriye û ne jî kesekî xwîniye û tu ji wî alî reviyaye vî alî da ku tu ji wan bitirsî û ne jî bihna konevaniyê ji te tê da ku tu ji ber wan bazdî. Pîra Meyr, cara dawiyê, bi sertî jê dixweze ku ew here û